

tevaya Tevera Kurd û tevgera demokrat li Sûriyê re. Çunkî ne hertim û ne jî li her cîyekî ew xebatkar peyda dibin, yê ku yekîtiya partî û tevgera xwe û berjewendiyê gelê xwe di ser her tiştekî din re digrin. Lewre jî em vê koçbarkirina dawiyê ya mamosteyê nemir Îsmayîl Omer weke jîdestdaneke mezin, pir mezin, dibînin. Lê yê ku hinekî dilê mera rehet dike ew e ku dawîya jiyânê ji xebtkarên weke mamoste Îsmayîl Omer re destpêka jiyaneke nû ye. Mamoste Îsmayîl ne mirî ye, ew di wijdana gelê xwe de zindî ye, ew tev li çî li welêt, çî-karwana nemir û şehîdan bûye. Xwedîderketina keç û lawên kurd li rehmetî vê rastiyê diçespîne.-jî li derveyî welêt

### **Xwîşk û birayên hêja,**

Di heman dema ku em ji gelê xwe re, ji dost û hevalên partî û tevgera xwe re, her weha ji tevgera demokrat a sûrî seranser re dibêjin: bila cihê rehmetî Buhuşt be û serkeftin jî ya doza me ya netewî û demokrat be, dixwazin bînin bîra me tevan ku xwedîderketina li xebatkar û nemiran tenê bi xwedîderketina li bawerî û bîrdozên wan dibe. Loma jî ji me hemû heval û hevriyên nemir tê xwastin ku em rojekê zûtir li xwe vegerin, berjewendiyên bilind yê gel û tevgera xwe di ser hertiştekî din re bigrin, da ku em hemû bi hev re kari bin yekîtiya Tevera Kurd û avakirina lêvegereke kurdî di demeke nêzîk de ji gelê xwe re, ji xebtkarên zindî û ji şehîd û nemirên xwe re bikin mizgîn. Ev berpirsiyariyê me li hember gel û nemirên me ye. Tenê bi vê yekê em dikarin xebata xwe ya li pênavî avakirina sûriyê demokrat, ku tê de hemû mafên netewî yê gelê me bêne bidestxistin, xort û berhemdartir.

Bi yekîtiyê wisa, helbet, emê hem baştir kari bin bi hêz û kesên demokrat ên ne kurd (ereb û aşûr) re bidin û bistînin, hem li hember destlata şoven kari bin bi hêz xwe

ragirin, hem jî çêtir bi erk û stûbariyên xwe yê netewî beramberî birayên xwe li perçên din ên Kurdistanê rabin. Ji bo pêkanîna van erkên pîroz jî em soz didin ku emê her di vê yekê de berdewam bin: Ji bo yekirina Tevera Kurd li Sûriyê çî ji destê me bê, emê bikin. Ji ber ku yekîtiya Teverê li ba me ne durûşmeyeke xwefodilkirinê ye, belê ew armançeke bingeîn e.

Li dawiyê em careke din sersaxiyê ji tevaya gelê kurd û tevgera wî ya rizgarîxwaz re hêvî dikin û dibêjin: Bila cîyê nemir her Buhuşt be. Serkeftin jî helbet dûr an nêzîk ya doza gelê me ya netewî, demokrat, rewşa û dadmend e.

Hezar silav ji giyanê nemir Îsmayîl Omer re Hezar silav li giyanê hemû xebtkarên kurd Serkeftin bo doza gelê me yê kurd Bijî azadî, demokrasî û wekhevî Komîteya Serkirdayetiya Rêxistina Ewropa ya

### **Partiya Yekîtiya ya Demokrat a Kurd li Sûriyê – Yekîti**

**Elmaniya- Herne, 24.10.2010**

\*\*\*\*\*

### **Ragihandin**

**Bi** şîn û êşeke mezin me nûça koça dawî ya xebatkar Ismaîl Umer serokê partiya yekîtiya dîmoqrata Kurd li Sûriyê( yekîti) bihist, di dema ku em sersaxiya germ pêşkêşî hevalên partiya yekîtiya dîmoqrata Kurd li Sûriyê dikin, me di rêxistina Elmanya de ya partiya dîmoqrata pêşverû ya Kurd li Sûriyê, biryar daye ku em wê ahenga ji bo vejandina bîranîna bîst û şeş saliya koça dawî ya helbestvanê mezin seydayê Cegerxwîn ya ku wê li bajarê Vechta li Elmanya di 23.10.2010 an de bihate sazîkirin, têkda bibin . Her weha em jî bi hevalên partiya yekîtiya dîmoqrata re vê şîne di koça dawî ya mamoste Ismaîl Umer de yê ku pirê jiyana xwe di berdestiya pîrsa mîletê xwe de terxan kiriye, pevra dikşînin .

Em sersaxiya hevalên partiya yekîtiya dîmoqrata Kurd li Sûriyê û ya hemû zarûzêçên gelê Kurd bi vê koça dawî ya kurekî wanî xebatkar, dikin.

**Rêxistina Elmanya ya partiya dîmoqrata pêşverû ya Kurd li Sûriyê 18-10-2010**